kurmandji

Rêbazên lîstikê

Lîstika ku hûnê niha bilîzin ji aliyê 12 ciwanên Sandvikenê ve hatiye çêkirin ku di navbera salên 2021–2024` an de di Projeya Qanûna Lîstika de xebitîn û li wir bi armanca hînkirina mafên zarokan lîstikek çêkirin.

Lîstik înteraktîfe û beşdarvan di tîmên wekî welatên cuda de dilîzin ku armanca wan ewe ku bibin welatê herî baş ji bo zarokan, ew hem li hundur hem jî di navbera welatan de hevkariyê dikin.

Proje ji aliyê Allmänna Arvsfonden ve hatiye fînansekirin û ji aliyê komeleya DramaMera ve hatiye li dar xistin.

**Naveroka lîstikê:**

- Qada lîstikê ya 25 metre ji çargoşê ku li çar çarçikên goşeyê reş yên mezin û 16 çarçikên rengên cuda dabeş dibin
- Zareke zerî mezin
- Fîgureke lîstika zer
- Çar qutiyên zer, ji bo her welatekî bi naverok:

Pênûsa nîşanker
Pênûs
Deftera têbinî
Lîsta pera
3 milyon Barnoz
Pirtûka Peymana Mafên Zarokan
Kaxeza A4
Danasîna rê

- Qutiyeke spî ji bo rêber bi naverok:

Pirtûka Peymana Mafên Zarokan
Kartên Welatan
Lîsteya peran
Seata wextgirtinê
Lîsteya rê
Perên zêde
Pênûs

Kartên cûda yên ku ji bo çarçikên rengîn têne bikar anîn:
ŞÎN:

Tevgerên ku ji bo mafên zarokan dixebitin
Kartên ku zarok cîhanê diguherin
Karên afirîner
Kartên Quizê
Kartên esrarengêzî
KESKÊ TARÎ: Nûçeya lezgîn-Qert

XEMRÎ: Kartên leystikê
KESKÊ VEKİRÎ: Lîstîka Bêdeng
PEBA WEKIRÎ: Tevgerên hevkar

**Agahiyên pratîkî:**
Ji dervî qada lîstikê, pir beşê cîh li dora qadê hene da ku hûn karibin ji xwe re bimeşin.
Qada lîstikê bi mezinahiya 25 metre çargoşe ye û ji ber vê yekê pêdivî bi qadeke mezin ku mirov bikaribe tê de bilîze heye. Ji ber ku li derve lîstik pir baş tê kirin.
Hejmara lîstikvanên pêşniyarkirî 12–16 beşdarvanin û pêwistî bi du rêberên lîstikê hene.
Devereke hilanînê, wek nimûne cîyek ji bo materyalên rêberan jî pêwiste.
Dema lîstikê bi avêtina zarê re 60 deqîqe ye.

**Berî destpêkirna lîstikê:**

*Berî hatina beşdarvanan:*
Rêberên lîstikê qada lîstikê amada dikin, çargoşe rengîn dikarin wekî ku hûn dixwazin werin danîn, yên reşî mezin divê li her qozîyekê werin danîn. Di navbera qoziyan de çar çargoşe hene.
Li wêneyê qada lîstikê meyzînin.
Naveroka qutiya spî nîşan bikin û hemû naverokan bixinê ku rêberan bi hêsanî bibînin.

*Çaxê beşdarvan dikevin hundirû:*
Danasîna kurtenivîsa lîstikê ji bo hevkariya di navbera Welatan de ye û ew li ser fêrbûna mafên zarokane. Ji vê sedemê, hûnê weke welatên cur be cur bilîzin û bixwazin ku welatê xwe bikin welatê herî baş ji bo ku zarok karibin lê bijîn.
Danasîna ku lîstik 60 deqîkan tê lîstin bikin, hemû welat heman fîgurê lîstikê bikar tînin û lîstik carinan di hundirê welat de û carinan jî bi hevkarî digel welatên din têne kirin.

R êberên lîstikê beşdarvanan li çar koman dabeş dikin û wan li her qozîyeke reş ya çargoş bi cih dikin, dûv re li her welatekî qutiyek zer belav dikin û naveroka qutiyê ber çav re derbasdikin (wek yên jor).

Paşê r rêberên lîstikê ji bo her Welatekî qerteka Welat belav dikin û ji Welatan daxwaz dikin ku nivîsên li ser qertan bixwînin. Paşê navê welat li ser kaxezeke A4 binivîsînin û bi awayekî xuyakirî li ser çargoş reş bi cîbikin.

Hemû Welat bi kurtasî danasîna welatê xwe dikin û bi dengekî bilind ji welatên din re dixwînin. Paşê wext ji bo xwendina lîsta bûhayê heye ku 3 tiştên ji bo welatên xwe pêwist dibînin bifikirin û bikirin.

Gava ku hemû welat qediyan, rêberê lîstikê diçe û meqbûzan îmze dike da ku her kes bizane wan çi kirî ye.

Paşê her Welat Zarê davêje û Welatê ku hejmara herî mezin avêt dest bi lîstikê dike.

**Lîstik dest pê dike:**
Welatê ku hejmara herî mezin bavêje, ew pêşî dest bi avêtina zarê dike û bi qasî hejmara zarê bi hejmarek fîgurên lîstikê gavan diçin.
Baldar bin ku çarçikên reş yên mezin nayên jimartin.

Welatê ku zarê diavêje fîgurên lîstikê bi qasî hejmara xalên li ser zarê gava diavêje. Paşê welat tê ser çargoşeke û rêzanê lîstikê agahdariya ka çi li wir diqewime dide. Danasîna rengên li vir dikarin di defterê de bibînin.

Hemû welat heman wezîfan pêk tînin û ji hev re û ji rêberên lîstikê re rapor dikin.
Dema ku wezîfe qediya, lîstik ber bi welatê din ve diçe û hwd.
Lîstik heta 60 deqîqeyî domdike û piştî wê rêberên lîstikê bi dorê li hemû welatan digerin bê her welatekî çend îmze danehev dijmêrin. Rêberên lîstikê îmzeyên hemû welatan kom dikin û radigihînin grûpa ku bi hev re X-hijmar tişt ji lîsta bûhayê kirîne û welatên xwe ji ber vê sedemê ji bo zarokan xweştir kirine!

kurmandji

Rawekirina rê

| | |
|---|---|
| | Dewlet<br>Her tîmekî lîstikê wek welatekî xeyalî dilîze. Hin welat di warê mafên zarokan de zor û zehmetiyên xwe hene. |
| **ELMASA BIÇÛK** | Her welat dikarin ji bo welatê xwe tiştekî bikirin |
| **ELMAS NAVÎN** | Her welat dikarê ji bo welatê xwe du tiştan bikirê |
| **ELMASA MEZİN** | Her welat dikarê ji bo welatê xwe se tiştan bikirê |
| | Wezîfeyên afirîner<br>Hemû welat heman wezîfeyê pêk tînin<br>Piştî qedandina wezîfeyê, Qerteke sehrebazî bistînin. |
| **??** | Quiz<br>Her welat sê pirsan werdigire ku bersiv bide.<br>Bersivên pirsan di pirtûka bi navê Peymana Mafên Zarokan de heye. |
| | Nûçeya lezgîn!<br>An hûn Barnoz distînin anjî hûn ji Barnoz xilas dibin! |
| | Lîstik<br>Mafê hemû zarokan heye ku bilîzin, lewra em niha dilîzin! |
| | lîstika bêdeng!<br>Rêberên lîstikê qertekê digirin û lîstika pêderxistina gotinan şanî didin. Hemû welat divê texmîn bikin ku ew li ser çi gotarê ye. Bersiv di pirtûka Peymana Zarokan (PZ) de heye. |
| | Karê hevbeş<br>Hemû welat hevkariyê dikin! |

kurmandji

Welat: Malvaya
Li welatê we paşayekî dijwar û dewlemend hukum dike. Gelê mayî feqîr in. Ji bo perê xwarin û malê divê salmezin pir kar bikin. Divê dê û bav heqê unîform û pirtûkên dibistanê bidin, naxwe zarok dê nikaribe here dibistanê. Gelek malbat ji mecburî bi hev re jiyan dikin ji ber ku erzantir e, lê ew pir teng û nerehatiyê çêdike.

Welat: Ayanado
Serokê welatê we dixwaze ku welat bibe welatê herî baş di cîhanê de. Divê hemû zarokên li dibistanê xwedî notên herî baş û bilind bin. Dibistan bi belaş e. Xwendekarên ku notên herî baş werdigirin, wekî xelat, komputeran didin wan. Tu wek kesekî salmezin bernakevî ku zarok xwe dibin zexta dibistanê de hîs dikin, ji vê sedemê gelek zarok li Ayanado çûna dibistanê red dikin.

Welat: Hemroza
Li welatê we, dêûbav difikirin ku ew her tiştî çêtir dizanin. Ew biryara ku zarokên wan dê bi kîjan hawalî re bin, kijan cil û berga li xwe bikin û herin kîjan aktîvîteyên dema vala didin. Zarok fersendê nabînin ku bi jiyana xwe bifikirin. Pir caran mamostan hewl dane ku li ser pirsgirêkê bi dêûbavan re biaxivin lê ew naxwazin guhdar bikin.

Welat: Qudo
Li welatê we her kes bi çandiniyê debara xwe dike û li gorî kevneşopiyeke kevn divê her kes bi taybet Neynûkeke wî kesk rengkirî hebe ji bo ku sebzên wan baştir û zêdetir şîn bebin. Ew rengê kesk ku li Neynûka xwe didin jehr têde heye û Pizîşk dibêjin divê welatiyên Qudo dev ji bikaranîna vê berdin lê mirovên kal/salmezin guh nadin vê û bi her awayî berdewama Neynûka kesk dikin.

Welat: Sullala
Li Sullala bi Olekêl bawer kirin qedexeye. Qanûn destûrê nadê, ku dua bên kirin anjî li ser xwedayên xwe biaxivin. Li vî welatî, ji ber, ku nahêlin zarok cejnan pîroz bikin, sirûdên olî bibêjin anjî limêj bikin pir xemgîn in.
Ji ber vê sedemê gelek niştecîh bi dizî dua dikin, Ger polîs vê yekê bibîne, ew têne zindan kirin.

Welat: Ellayha
Li Ellayha`yê pirraniya zarokan por xelxelokî çêdibin û kesên por rast jî bêqidoş tên dîtin. Zarok û salmezinên ku porên wan rastin, li Dibistanê û li cîhê kar têne îzole kirin. Niha hikûmeta we biryar daye ku alîkariya welatliyên por rastkirî bike lê hemû welatliyên din li dijî vê biryarê ne, her roj xwepêşandanan çêdikin.

Welat: Alinia
Li welatê we xwezayeke pir xweş heye, lê piraniya salmezinên welatê we di fabrîkên mezin de kar dikin û ev jî debe sedema berdana bermayiyê û jehrdadan kirina xweza ya bedew. Ji berdana bermayiyên fabrikan carna ziwabûna zêde çêdike carna jî baran zêde dibare. Di dema herî dawî de baraneke pir zêde bariye û bûye sedema rabûna lehiyên mezin ku zarokan nikarîbûne herin Dibistanên xwe.

Welat: Rozato
Keyayê Rozato, ji bo ku welatên din çopa xwe bavêjina welatê we pera distîne. Her der tiji Zibil bûye, li Daristanan, Peravan û Kolanan. Çiyayên ziblê mezin dibin, heywan û nebat dimirin. Av wisa pîs bûye, ku edî mirov nedikarê wexê û ne jî xwe pê bişo. Bêhneke pir nexweş dide der û dora xwe. Ji vê sedemê dêûbav zarokên xwe naşînin Dibistanê.

Welat: Ayosho
Li welatê we çûna Dibistanê ji bo keçan qedexe ye, karê wan tenê paqijî û çêkirina xwarina malê ye. Biryara her tiştî bav didin û carinan jî destûrê nadin ku keç hevalên xwe bibînin. Pirên caran keçik bê dilxwazi tên zewicandin.

Welat: Mitokoroto
Li welatê we, bê hema her kes Otomobîlan tajon, lê Otomobîlên li Mitokoroto hejmareke zêde dû derdixin ku hewayê gewr tarî û behnê xeternak dike. Hikûmet ji niştecihan dixwaze ku li Otobus û trênê siwar bibin, lê ji ber ku buhatir e, mirov zêdetir Otomobîlan dajon.

Welat: Jonjolito
Li welatê we gelek kes baweriya xwe bi "Kitêba Pîroz" tînin, lê yên ku baweriya xwe bi "Kitêba Pîroz" naynin li hember wan xerabî tê bi kar anîn. Lê salmezinên ku nebehwermendin di peydakirina kar anjî di standina alîkariya perên zarokan de zehmetiyan dikişînin û notên dersa yên xerab didin zarokên wan. Ji ber ku ew dizanin li welatên din derfetên baştir yên xwendin û jiyanê hene lawra pir kes dixwazın ku ji Jonjolito biravin herin.

Welat: Xedrata / Khadrata
Li welatê we gelek pirtûkxaneyên hêja hene, lê serokê Xedretayê biryar daye ku tenê pirtûkên ku wê bi xwe nivîsandine hebin û divê her kes wan bixwîne. Her weha, her kes ji neçarî tenê Xedratî diaxivin, tevî ku gelek kesên bi zimanên din diaxivin hene.

## ŞÎN
Karên afirîner

Mirovekî xeyalî bifikirin. Divê ew zarokek ji welatê we be û wî ji bo niştecihên welatê xwe tiştekî girîng kiribe. Paşê hûnê ji me re li ser zarokê biaxivin û rêber jî dê li ser zarokê pirsan ji we bikin.

Mafê hemû zarokan yê lîstik û kêfê bikin heye. Li ser lîstikeke ku hûn jê hez dikin û dixvazin bilîzin ji me re bibêjin.

Cîranekî kal ku hûn nasdikin her car digot: "Dema ku ez ciwan û bêaqil bûm û li derve sar bû, min tu carî Kum nedida serê xwe. Lê niha ez pîr û biaqil im û dema ku sar be, ez qet bê Kum naçim derve!”
Ma hûn jî di heman baweriya cîranê xwe dene ku ciwan ehmeq û pîr jîrin?

Helbestekê (kurtenivîs) li ser zarokan binivîsin ku ji mafê wana tiştên ev bixwazin û bifikirin bibêjin, ji vê re Azadiya Mafê Axaftinê tê gotin û li Swêdê ev qanûne.

Hûn ê kurteçîrokekê li ser zarokeke ku ji bo cîhanê tiştekî girîng kiriye bixwînin. Tiştekî hûn herî balkêş bibînin hilbijêrin û li ser wê ji me yên din re biaxivin.

Hûn bi bedenên xwe peykerekî çêdikin û demeke kurt hemû tevde di pozîsyoneke bêdeng û bêtevger de disekinin. Divê peyker, bê hûn li welatê xwe çi guhertinan dixwazin bikin nîşan bide. Û em yên din jî ka hûn çi nîşan didin texmîn bikin.

Li ser rewşeke ku salmezinan yek ji xalên Peymana Mafên Zarokan binpê kirine bifikirin. Hûn dikarin ji pirtûka Peymana Mafên Zarokan îstîfade bikin. Dema ku we li ser pozisyonekê bîryar da, hûnê bi çêkirina peykerekî bi bedenên xwe nîşan bidin. Ango divê hûn bi hev re bikevin pozîsyonekê û demek kurt bi tevahî bêtevger û bêdeng bisekinin. Da ku rêber texmîna xwe ya li ser peyker bikin bê ka çi tînê ziman.

Çîrokekê li ser welatekî xweş û xeyalî ji bo zarokan binivîsînin, welatekî wisa ku nîne lê we dixwest ku hebûna. Çîrokê bi peyvên "Carekê ji caran …" dest pê bikin û bi "Rehmel li dêûbavên hazir û guhdaran /Snipp, snapp, snut çîrokê bi dawî bikin ". Paşê wê çîrokê ji me yên din re bixwînin.

Divê her kes Mafên Zarokan bizanibe
da ku tu kes bêzar nebe.
Nivîsek anjî lîstikekê li ser Mafê Zarokan
bi ristin anjî çêkin
da ku salmezin li ser vê yekê dudilî nemînin.

Hûnê kurte danasîna rêxistineke ku ji bo baştirkirina rewşa zarokan dixebite bixwînin. Li ser logoyeke ku rêxistinê baş bidê nasîn bifikirin û nexşbikin. Paşê hûnê fikir û ramanên xwe yên li ser logoyê ji me yên din re nîşan bidin û danasînin.

Di wêneyê de hûn zarokeke ku li cem mirovekî salmezin xwe ewle hîs dike dibînin. Demekê li wêneyê binêrin. Paşê li ser vê pirsê di welatê xwe de bi hev re biaxivin: Li gorî we divê mirovên salmezin çi bikin da ku zarok bi wan re xwe ewle hîs bikin? Paşê ji me yên mayî re ka hûn li ser vê çi axivîn bêjin.

Ji bo hûn balê bikşînin ser rewşa zarokên li welatên xwe dixwazin xwepêşandanekê li dar bixin. Biryara bê li ser posterên we divê çi werê nivîsandin bi hev re bidin. Paşê li ser kaxeza xwe ya A4 binivîsin û nîşanî me yên din bidin. Hevkariyê bihevra ji bîr nekin.

kurmandji

Pirsên QUÎZ`Ê

1. Di Peymana Mafên Zarokan de çend xal hene?
2. Li gor Peymana Mafên Zarokan heta temenekî tu zarok tê hesibandin, çiqase?
3. Ma salmezin dikarin li ser Ola zarokê biryarê bidin?
4. Peymana Mafên Zarokan ji bo kîjan zarokan derbas dibe?
5. Peymana Mafên Zarokan çi ye?
6. Kîjan salmezin xwedî berpirsiyariya herî mezin ya zarokekê ye?
7. Ger zarokek bi dayik û bav be, yek ji dêûbavan dikarê bê daxwaza dêûbavê din bi zarokê re here welatekî din?
8. Gelo hemû zarok xwedî Mafê Axaftina Azadin? Ango dîtin û baweriya xwe dikarin bibêjin?
9. Gelo destûra salmezinan heye ku rojnivîsa zarokan, peyamên nivîskî, name û meylên wan bixwînin bê ku zarok jê hayadar be û bêje destûr heye?
10. Gelo mafê zarokan yên lîstîkê heye?
11. Ger zarokek kar bikê (mînak, karên havînê anjî dawiya hefteyê kar bike), dê kî mûçeyê bistîne? Zarok an dêûbav?
12. Ji bo ku zarok biçe dibistana sereta (ango ji pêşdibistanê heta pola 9an) divê malbat çiqas pere bide?
13. Ger salmezinek, wek mîne mamostekek bêjê, ji ber ku navê zarokê zehmete ez tim ji bîr dikim, gelo destûr heye ku mamoste navekî din lêbike?

kurmandji

BERSIVÊN QUIZ`Ê

1. Peymana Mafên Zarokan ji 54 xalan pêk te
2. Li gor Peymana Mafên Zarokan, zarok heta 18 saliya xwe zarok e (benda 1).
3. Na, Tu dikare bi xwe biryara xwe bide bê tu kijan Olê hildibijêrê anjî naxwazê bi tu Olê ve girêdayî be (Xala 14)
4. Peymana Mafên Zarokan ji bo hemû zarokên li kîjan welatî dibin bere bin, bêyî cudahiya paşbingehî ya zarokan derbas dibe (Xala 2)
5. Lîsteya mafên zarokan, ku ji bo hemû zarokan derbas dibe. Pêwiste ku salmezin vê bişopînin.
6. Dêûbav/welî anjî serpriştê zarokê berpirsiyarê herî mezin li hember zarokan in. Carinan dibe, ku hewcedariya wan bi alîkariyê hebe. (Xala 18)
7. Na, ger zarokek dayik û bavê xwe hebe, divê herdu jî erê bikin. (Xala 11)
8. Belê, hemû zarok xwedî Mafê Azadiya axaftinê ne (axaftin, fikir û ramanên xwe bibêjin). Zarok dikarin ramanên xwe bi nivîsandin, axaftin, rengkirin, bi çêkirina muzîkê, xwendinê û hwd nêrînên xwe bînin ziman. (Xala 13)
9. Na, mafê zarokan yê jiyana taybetî heye. (Xala 16)
10. Belê, mafê hemû zarokan ji bo ku bilîzin, bêhna xwe vedin û dema xwe ya vala derbas bikin heye. Pêwiste destûr bê dayîn ku zarok di dema xwe ya vala de tiştên kêfê bikin, wek mînak lîstina werzîşê anjî govendê. (Xala 31)
11. Ger zarok kar bikê divê mafê zarokê bidin zaroke. (xala 32)
12. Mafê hemû zarokan ji bo ku biçin dibistana sereta heye û malbata zarokê ji bo vê pêwist nake pera bide (madde 28).
13. Na, mafê hemû zarokan li ser navê xwe heye. (Xala 7)

ŞÎN
Kartên Esrarengîz

Cara werê ku figura lîstikê li almasekê bikeve, hûn ji kirîna tiştan têne asteng kirin.

Cara din ku fîgura lîstikê li almasekê bikeve, hûn dikarin 2 tiştan bikirin.

Pêwiste tiştê ku we kirî hûn şûnde vegerînîn!

Mega kart!
Cara werê ku fîgura lîstikê li almasê bikeve, hûn dikarin 4 tiştan bikirin.

Hûn 200,000 Barnoz distînin!

Hûn 400,000 Barnoz distînin!

Pêwiste hûn 200,000 Barnozî şûnde bidin!

Pêwiste tiştekî ku we kirîbe hûn şûnde vegerînin!

kurmandji

Elmasa biçûk
Pîroz be!
Elmaseke piçûk şansê dide hemû welatan ku tiştekî ji bo welatê xwe pêwist dibînin bikirin!
Diyare çend welat dixwazin heman tiştî bikirin lê têra her kesî nake, divê welat bi hev re biaxivin û bi awayekî çareser bikin.
Rêber divê ji bo ku welat bi rêyên aştiyane bigihêjin çareseriyekê hewl didin.
Serkeftin!

Elmasa navîn
Pîroz be!
Elmasek navîn şansê dide hemî welatan ku du tiştên ku ji bo welatê xwe pêwist dibînin bikirin! Her çiqas diyare çend welat dixwazin heman tiştî bikirin lê têra her kesî neke, pêwiste welat bi hev re biaxivin û bi awayekî çareser bikin.
Rêber divê pişgiriyê bidin ku welat bi rêyên aştiyane bigihêjin çareseriyekê.
Serkeftin!

Elmasa mezin
Pîroz be!
Elmasa mezin derfetê dide hemû welatan ku du tiştên ji bo welatê xwe pêwistin dibînin bikirin! Her çiqas diyare çend welat dixwazin heman tiştî bikirin lê têra her kesî neke, pêwiste welat bi hev re biaxivin û bi awayekî çareser bikin.
Rêber divê pişgiriyê bidin ku welat bi rêyên aştiyane bigihêjin çareseriyekê.
Serkeftin!

PEMBE
Xebatên hevkar

Bi bedenên xwe tablokê çêkin!
Her kes di xelekê de radiweste û yek bi yek dikevine xelekê û dibêjin "Ez im..." û bi bedena xwe peykerekî bêlivîn û bêdeng çêdike. Divê peyker mijara berjewendiya zarokê be (Mîne, "Ez dibistanek im"). Dema kesê yekem qedand, ew di cîhê xwe de dimînê û kesekî din berdewam dike. Her kes di cihê xwe de dimîne heta ku yên din jî peykerên xwe çêkirin.
Bi hev re we tabloyek çêkir!

4 goşe
Kîjan pîşe ji bo zarokan herî girîng e?
Rêberê lîstikê çarçikên reş li çar goşên cûda dabeş dike:
1. Mamoste
2. Polîs
3. Doktor
4. Pîşeyekî din

Beşdarvan êdî dikarin goşekekê hilbijêrin, li wir rawestin û bi yên din re li ser heman goşê biaxivin ka çima wan ew pîşeya taybet hilbijartina û paşê ew ji beşdarvanên din re dibêjin. Piştî wê rêberê lîstikê dipirsê gelo kesekî ku bixwaze goşa xwe biguherê heye?

Rêxistineke ku mafê zarokan diparêzê ava kin!
Pirsgirêkên hemû welatan yên cuda hene, niha bi hev re rêxistineke mafê zarokan ava bikin û bi hevre re biyar bidin bê di welatê we dê li ser çi bixebitin. Navê rêxistinê çi ye? li ser çi dixebitê? Hevkariya bi hevre re ji bîr nekin.

Kîjan maf winda ye?
Li gorî we ji Peymana Mafên Zarokan çi kêm e? Li Pirtûka Peymana Zarokan meyzînin û bi welatliyên xwe re biaxivin. Paşê bi welatên din re li ser wê biaxivin û li ser xaleke ku hûn dixwazin têxin nav Peymana Mafên Zarokan li hev bikin.
Hevkariya bi hevre re ji bîr nekin.

Pere bexşîn!
Rêberê lîstikê qerta welatekî ku dinav lîstikê de nîne dikşîne û paşê ji teva re raber dikê ku her çar welat girînge bi hev û din re li hev bikin bê ka bi çiqas bexşandina pera hewceyî heye da ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên li wî welatî tev wek hev karibin bibin alîkar.
Divê ji Qaseya her welatekî wek hev pere bên standin.
Hevkariya bi hev re ji bîr nekin.

kurmandji

XEMRÎ
Lîstik

1–7
Hemû beşdarvan di xelekekê de radiwestin.
Kesek dest bi şandina hejmara 1 dike û bi dengekî bilind gotina 1 dibeje heman demê kefa xwe ya rastê dide ber milê çepê anjî kefa çepê dide ber milê rastê li gora ka ew hejmarê bi kîjan alî dixwaze bişîne dike.
Ger ew ber bi hela rastê ve bişîne, ji kesê herî nêzî milê wî yê rastê re dibêje 2 û di heman demê de kefa xwe dide ser milê xwe yê rastê an çepê û ji yê 2`an re dişîne. Yê 2`yemîn jî bi heman şêweyî berdewam dike.
Ev yek berdewam dike heta ku hejmara 7 tê, paşê li şûna ku ew kes nîşana kîjan milê xwe bide û bi kîjan alî ve bişînin, destê xwe datîne ser serê xwe û dibê 7, li wir bi teliya xwe kb^r kîjan alî nîşan dide hejmar bi wê helê de tê şandin. Dema ku hejmara 7 hat gotin, her tişt bi hejmara 1`ê ji nûve dest pê dike.

Ger beşdarvanek ji bîr bike anjî şaşiyeke bike, divê ew wek ceza li dora xelekê carekê zû bimeşe anjî bazbide.

Ejderha
Ji bilî yek beşdarvanî tevê din wek xelekekê radiwestin û yek jî di nîvî de.  Destên xwe mîna "cinawirekî" dirêj dike û dibe Ejderha.
Ejderha paşê hêdî hêdî û rasterast ber bi kesekî ku di xelekê de dimeşe hewl dide ku wî bigire, ji bo ku neyê girtin, divê ew kes navê beşdarvanekî din ku di xelekê de rawestaya bêjê. Ejderha wê çaxê berê xwe diguherînê û hewl dide ku li şûna wî kesekî din bigire. Ger kesek were girtin, ew dibe Ejderha.

Hi haj ho!
Hemû beşdarvan di xelekikê de radiwestin.
Yek ji wan li kesên din dinerê û HI diqîre û bi herdû destên xwe weke tîrekê rastî wî kesî dirêj dike û wî nîşan dide. Yê ku HÎ jêre tê gotin (ango raber tê kirin) di heman demê dibe HAJ û her du destên xwe dirêjî ser serê xwe dike û wan dike mîna tîrekê û wî kesî nîşan dike.

Kesên herî nêzîk û li herdû aliyên kesê ku HAJ diqîre, dê zendên xwe bikine mîna tîrekê û berê xwe didine aliyê kesê ku HAJ qîriya û HO diqîrin.

Kesê ku HAJ qîriya ye divê paşê li kesekî nû binêre û HÎ biqîre û hwd.

Yê ku wenda bike, divê ji komê derkeve.
Hemû beşdarvanên din bê ku ji ciyê xwe bilivin disekinin û lîstik jî heta ku tenê du kes bimînin berdewam dike, paşê her tişt bi dueloyê bi dawî dibe.
Her du kes pişta xwe didin hev û kom kesê ku duelo bi ser xistî ye dest nîşan dike. Rêber dibêje, wek mînak, mehên cuda û piştre yên di dueloyê de ne, divê ji bo her mehê gavekê bi pêş de bavêjin. Lê belê ku rêber wek mînak, rojek hefteyê bêje, divê ew zû bizivirin rûyê hev û yê ku pêşî bizivirê serdikeve.

Lîstika Qudrat

Hemû beşdarvan di xelekeke mezin de radiwestin, ji bilî kesê ku di nîvî de rawestaye.
Yê ku di nîvî de ye divê çavên xwe bigire (ger hêsantir be, hûn dikarin çavê xwe girêbidin).
Yê di nîvî de paşê bi dengekî bilind dibêje BIMEŞİN!
Her kesê di xelekê de dest pê dikin ku hêdî hêdî li dora xelekê bimeşin.
Kesê di nîvî de dikarê kengî ku bixwazê bê STOP, hingî divê her kes bisekine û kesê di nîvî de çav girtî bi texmîn yekî nîşan dike ku ew rawestîye. Ew kesê ku rast hata destnîşan kirin, pêwiste ji xêlekê derkevê.
Yê li nîvî dîsa dibe BİMEŞİN û her kes dest bi meşê dike.
Lîstik heta ku yê di nîvî de herkesê ku dimeşê dest nîşan dike her berdewame.

<u>Destlêxistina hevalekî</u>
Ji bilî yekî, hemû beşdarwanên din wek cot bi cot dabeş bikin û ji wan daxwaz bikin ku di xelekê de bi yê li pêşberî xwe re rû bi rû rawestin, û du xelekên derve û hundirîn ava bikin.
Divê kesên di xeleka derve de herdu milên xwe ji hev vekin.
Yê ku bê cot û bi tena serê xwe di xeleka hundurîn de radiweste û dixwaze navêkî ji yên xeleka hundurîn bêjê û destê xwe lêxê. Kesê ku navê wî tê gotin divê zû hewl bidê ku bigihînê kesê ku gazî kiriye. Pêwiste yê li pişt bi zû destên xwe deyne ser milên wî/wê û bigire, divê peywî de nebaze.

<u>Sê tişt</u>
Hemû beşdarvan di xelekê de li ser piyane anjî rûnîştî ne. Hemû bihevre, Her kes bi dengekî bilind û bi hêz dibêjin: "Sê tişt!", di heman demê de sê caran li ronên xwe dixin, es axaftina xwe didomîne û ji kesê li kêleka xwe dipirse, wek mînak: "... ma tu li odeya xwe yî!", wê çaxê divê kes pir zû bersivê bide bê ka kîjan sê tişt di odeya wî/wê de hene.
Paşê her kes dîsa diqîrin: "Sê tişt!" û yê ku bersiv da jî dipirse: "... ya ku di pêlava te de ye!". Pêwiste ku hûn bêjin divê her tişt zû çêbe û tiştê ku di pêlav, oda, çenteyê kesî de heyî dibeku ne rast be.

Cilşok
Ji bilî kesê ku lîstikê bi rê ve dibe û di nîvê xelekê de radiweste hemû kesên din di xelekê de radiwestin:
Rêber kesekî îşaret dike û yek ji yên jêrîn diqîre:

CİLŞOK!
Paşê divê mirov çog bide û bejna xwe bihejîne. pêwiste kesên nezî herdu aliyan herdu milên xwe bikin çargoşa û nîşan bidin. Li wêneya 1 binerin.

MAKÎNEYA NANQAMRANDINÊ!
Paşê kesek xwe hildidê jor û di heman wextî de jêr û cend caran dibêje "Mekîna nanêqemirandî". Kesên herdu aliyên yê nêzî peşberî xwe, milên xwe dirêj dikin û nîşan didin. Li wêneya 2 binerin.

MEKÎNA TEVDANÊ!
Paşê ew kes herdu destên xwe bilind dike û dikê mîne tîpa V. Kesên nêzî hev dê milên xwe mîna mekîna tevdanê bizivirinin. Li wêneya 3 binerin..
Paşê rêber kesekî nû destnîşan dike û fermanê dide.

Ger kesek wenda bike wê çaxê ew dibe serok.

WÊNE 1
WÊNE 2
WÊNE 3

KESKÊ ZELAL
Çaxê Lîstıka bêdeng!

Rêberên lîstikê qertê dikişînin, li ser qertê Peymana Mafên Zarokan dinivîsê û paşê rêberên lîstikê vê gotarê bê deng bilîzin.
Welat di deftera têbinî de gotareke dinivsînin divê hûn jî hewl bidin û bifikirin bê di defterêde çi hatiya nıvîsandin eşkera bikin. Rêberên lîstikê welat bi welat digerin û dixwazin bersivên we bibînin.
Pêwîste nivîsên xwe hûn nîşanî welatên din nedin.
Serkeftin!

Ji mafê hemû zarokane ku tevlî meş û civînên aştiyana bibin.

Ji mafê hemû zarokane bê bi kijan xwedayî baweriyê bînin anjî ket neyînin

Ji mafê hemû zarokane ku herin dibistana serete

Tu kes nikarê dest bide bedena zarokê ku zarok nexwazê.

Ji mafê hemû zarokane ku di derbarê tiştan de ji Radio, Telefvizyon, Rojname û Înternetê fêr bibin.

Ji mafê hemû zarokane ku bilîzin, behna xwe vekin û demên xwe ya vala hebin

Ji mafê hemû zarokane ku jiyan xwe ya taybet hebe. Yên salmezin çênabe ku Deftera Têbînê, Name, Meyl anjî Mesajên zarokan bixwînin.

Tu kes nikare zarokan bikirin anjî bifroşin.

Pêwiste salmezin hemû zarokan ji alkol û narkotîkê û hwd. biparêzin.

Hemû zarok xwedî mafê lênerîna tenduristiyê ne.

kurmandji

KESKÊ TARÎ

Nûçeya lezgîn

Rêxistin, hevkariya navbera welatan dike û 200,000 Barnozî dide welatê we ji bo ku rewşa zarokan baştir bibe.

Siyasetmedarên welatê cîranê we Lindiosa biryar dane ku 400,000 Barnozî bidin we da ku rewşa zarokên welatê we baştir bibe.

Li welatê Adnamayê erdhejek çêbû û rêxistina Hevkariya Navbera Welatan biryar da ku divê hemû welat alîkariyê bikin. Ji ber vê sedemê her kes 200,000 Barnozî dide Adnama.

Li welatê Ayotê ev çend sal in lehî radibin û niha metirsiyeke mezin heye ku welatê we zirarê bibîne, ji ber vê yekê divê hûn 400 hezar Barnozî ji bo çêkirina bendan xerc bikin da ku zirarê kêm bikin.

Siyasetmedarên welatê Leakim dixwazin Peymana Mafên Zarokan ji hemû welatan rakin. Rêxistina Hevkariya Navbera Welatan biryar da ku 400,000 Barnozî bide we da ku hûn vê biryarê rawestînin.

Di vê meha dawî de bayên pir xurt rabûn. Gelek xetên Elektrîkê hatine hilweşandin û Rêxistina Hevkariya Navbera Welatan 400,000 Barnoz alîkariyê da we ku hûn xetên nû yên Elektrîkê ava bikin.

Welatê we bi gelek welatên din re banga civîneke mezin kir ku salmezinên girîng yên welatan li ser rewşa zarokan biaxivin. Ji bo xercên hevdîtinan divê hûn 200,000 Barnozî bidin.

Li welatekî cîran teqînek volkanîk pêk hat û li hin deverên welatê we hewa qirêj kiriye. Hûn hewcene ku bi 200,000 Barnozî maskan bikirin.

Di van demên dawîn de hejmara kurmên kartolan pir zêde bûne û hemû kartolên we xwarine anjî xirakirine. Pêwîste ku hûn ji Lindiosa kartolan bikirin da ku hûn pêdiviya xwe bi cî bikin. Bûhayê we 200,000 Barnoz e.

Piştî şewateke mezin li bakurê welatê we, piraniya zarokan nikarin alîkariya tenduristiyê bigirin. Ji ber vê sedemê divê hûn doktoran ji Lindiosa bixwazin ku karibin alîkariya we bikin. Bûhayê wê jî 400,000 Barnoz e.

Li welatê we di xwarinên Dibistanan de jehrî hatiyê dîtin ku zarok pê nexweş dikevin. Pêwîste hûn bi 200,000 Barnozî xwarinên din bikirin.

Di şewatekê de dermanxaneya we tev şewitî û pêwiste hûn bi 400,000 Barnozî dermanên nû bikirin.

Sazîya Navnetewî ya serbixwe Leken deydîka çêdike û dixwazê 200 000 Barnozî alîkariyê bide we da ku hûn li welatê xwe ji zarokên xwe re qadên lîstikê yên xweş çêkin.

Nişteciyên Lindiosa sendokeke mezin tije Barnoz dîtine ku di mirina şahbanûya wan ya dawîn, Adnil ve hatibû veşartin. Ji bo ku zarokên welatên din baştir bijîn, dixwazin ji welatê we re 400,000 Barnozî diyarî bikin.

Li welatê we îskeletoreke mezin yê Dînozorekî hatiye dîtin û ji welatekî li rojhilatê dinyayê bi 200 hezar Barnozî ji we dikire.

Rêxistina Hevkariya Navbera Welan kifşkir ku siyasetmedarên we bi salan ne di dana bacê de we dixapînin. Niha pêwîste hûn 400,000 Barnozî bidin Hevkariya di Navbera Welatan de.